Ji Emerîkê Serdarra

Gelî heval u hevkarêd ezîz,

gelî xebatkarêd kûltûra miletê kurd !

Li destpêkirna sala I977 ez pê hesîyam ,ku li Êrêevanê sala I975-da Ordîxanê Celîl berhevoka " Stranêd kurdî yê tarîxîyê" çap kirîye u giva ez -Qanatê Kurdo rêdaktorê wê kitebême.

Ordîxanê Celîl derheqa çapkirna wê berhevoke heta niha ji minra qet gilîk ne gotîye. Min lava li Tosinê kurê kurapê xwe kir, ku ji minra wê berhevokê bikire u bişîne.Ewî xwestna min qedadand.Niha ew berhevok li cem mine .Min xwend u ez ecêb mam, ku li paşîya wê nivisîne rêdaktor :"Qanatê Kurdo, Casimê Celîl" .

Hevalêd delal! eva ne raste, ez haj vê kitêbê nînim u qet tu cara min razîbûna xwe ne daye, ku wê kitêbê bi rêdaktorîya min çap bibin, Ordixane Celîl eva yeka bi xweserî xwe nivîsîye, min nikar bu qayliya xwe bida , çimkî teda materiyalêd plana xebata kabinêta kurdnasîyê hatne çapkirnê, Înstîtûta rohilatnasîyê ser pere xerc kirne, gerek bi tercima rûsî bihatana çapkirne çawan xebata plana înstîtûtê .

Wekî ez rêdaktor bûma, minê qolê xwe li ser destnivîsarê binivîsîya u honararê rêdaktorîyê ji bistanda. Şikir ji xwedê , min ne qolê xwe ser berhevokê nivîsîye , ku çap bikin, ne jî honarar standîye.

Hemu xer u gune li

Hemû xêr u gunê li stuyê Ordixanê Celîl u Casimê Celîl be, ez kêmasî u şaşîyêd wê berhevokê hilnadme ser xwe, çimkî ez di çapkirna wêda haj tiştekî ne bûme.Derheqa vê yekêda min e'lamî serwêrîya înstîtûta me kirîye u e'lamî wê jî dikim .

De bi xatre we, her bijîn u serbest u serfinyaz bin.

Qanatê Kurdo

20-II- sala I977 .Lênîngrad .